

Ji Edebîyata Devkî ya Kurdî Serhatîyeke Evînî: Salih û Kejê
û Deqeke Çapkîrî

Yaşar KAPLAN¹

Kürt Halk Edebiyatından Bir Aşk Hikâyesi: Salih ile Kejê ve
Yayınlanmış Bir Metin

Öz

Salih ile Kejê'nin aşk hikâyesi Kürt Halk Edebiyatının yaygın hikâyelerinden biridir. Bu hikâyenin dengbêjler tarafından oldukça geniş bir coğrafyada anlatılması bu durumu ortaya koymaktadır. Bu çalışma 20. yüzyılın başlarında yayınlanan Salih ile Kejê'nin hikâyesine ait bir metinden bahsetmektedir. Yayınlanan metin M. Dufresne isimli Fransız bir oryantalist tarafından Siirt'te derlenmiş ve 1910 yılında Journal Asitique dergisinde yayınlanmıştır. Bu makale, yayınlanan metnin harf çevirisini sunmakta ve aynı şekilde Salih ile Kejê'nin hikâyesinin sözlü kaynaklar vasıtasıyla korunan versiyonları hakkında bilgi vermektedir. Ayrıca bu aşk hikâyesi içerik, kahraman, yer ve zaman açısından tanıtılmakta ve yayınlanan metin ile sözlü varyantlar karşılaştırılmaktadır.

Anahtar Kelimeler: Salih, Kejê, Platonik Aşk, Palu Emiri, Sürgüçülü Hasan Bey.

Kurte

Serhatîya evînî ya Salih û Kejê serhatîyeke berbelav a edebîyata kurdî ya devkî ye. Ji aliyê dengbêjan ve di erdnîgarîyeke berfireh da vegêrana vê serhatîyê nişana vê çendê ye. Ev nivîs behsa deqeke serhatîya Salih û Kejê dike ku di destpêka sedsala 20an da hatîye çapkîrin. Metnê çapkîrî ji aliyê rojhilatnasekî Frensî yê bi navê M. Dufresne ve li Sêrtê hatîye tomarkirin û di sala 1910ê di kovara Journal Asitique da hatîye belavkirin. Gotar herfguhêzîya metnê çapkîrî dike û herwesa derbarê versiyonên serhatîya Salih û Kejê yê bi rêka jêderên devkî ve hatine parastin agahîyan dide. Dîgel vê çendê vê serhatîya evînî ji aliyê naverokê, lehengan, dem û cihî ve dide nasîn û berawirdîya deqa çapkîrî û varyantên devkî dike.

Bêjeyên Sereke: Salih, Kejê, Evîna Platonîk, Mîrê Palo, Hesên Begê Sûrgiçî.

¹ Dr. Öğretim Üyesi, Hakkari Üniversitesi, İlahiyat Fakültesi, Felsefe ve Din Bilimleri Bölümü, yasarkaplan111@gmail.com, ORCID: 0000-0002-3960-0201.

A Love Story from Kurdish Folk Literature: Salih and Kajje and a Published Text

Abstract

The love story of Salih and Kajje is one of the common stories of Kurdish folk literature. The fact that this story is told by dengbêjs (folk poets) in a very broad geography suggest show this fact. This study deals with a text of the story of Salih and Kajje, which was published at the beginning of the 20th century. The published text was compiled in Siirt by a French orientalist named M. Dufresne and published in *Journal Asitique* in 1910. This article presents the transliteration of the published text and also gives information about the versions of Salih and Kajje's story that have been preserved through oral sources. In addition, this love story is introduced in terms of content, characters, place and time, and the published text and oral versions are compared.

Keywords: Salih, Kajje, Platonic Love, the Emir of Palo, Hassan Beg Surgici.

Extended Abstract

The love story named Salih and Kajje is an outcome of the narrative song form commonly found in Kurdish folk literature. This love story is told by dengbêjs in a very large area. This situation both reveals the prevalence of the story and indicates that there are many different versions of this story. This love story is told in almost all regions that use the Kurmanji dialect. As far as we know, the story of Salih and Kajje was compiled and published for the first time by the French orientalist M. Dufresne. Dufresne heard this story from a dengbêj in the city of Siirt and later wrote it down. He used a strict method in transcribing the oral text and had the text he wrote in the Latin alphabet read over and over by a few people who knew how to read the Latin alphabet. This written text was published in *Journal Asitique* in 1910 with a French preface, Kurdish text and French translation. In addition, the love story of Salih and Kajje had been the subject of a novel in modern Kurdish literature. In this paper, a transliteration of the text published by Dufresne in accordance with the modern Kurdish alphabet has been created. Moreover, else this published written text, different versions of the story of Salih and Kajje, which were transmitted orally by the dengbêjs, have been identified. These versions are based on sound recording sung by dengbêjs and recorded on cassettes. The most important problem with these sound recording is that some recordings don't contain the whole story and are incomplete. Due to the abundance of records about the story of Salih and Kajje necessitated categorizing the records of this story in the context of the regions dengbêjs belong to and the cultural basin they live in. For this purpose, the oral versions of this story have been categorized into six groups: Afrin-Çiyayê Kurmênc, Plain of Suruc, Diyarbakır, Serhad, Bahdinan and Ezidkhan regions. When Salih and Kajje's Botan region text published by Dufresne is added to these, all versions are classified as seven main versions in total. Thus, after classifying the versions of story, it was tried to be analyzed in terms of content, characters, place and time. The story is briefly based on the

platonic love between Salih and Kajje. Salih fell in love with Kajje and started working at her father's house to be close to her. However, during this time, although both of them love each other, they didn't declare their love to each other. The Emir of Palo, heard the beauty of Kajje, upon this first asked her father for her hand and then married up with her and takes her to his mansion in his own castle. Unable to stand this separation, Salih found a way to work in the mansion of the Emir of Palo and had the opportunity to saw Kajje again. Three years later, Salih finally revealed his feelings for Kajje to her and received a positive response from her to his love. Thereupon, both of them escaped from the city and headed south, reaching the Sürgücü region of Mardin via Diyarbakır. However, they had to deal with many tragic problems on all their escape routes. Ultimately, they request for help Hasan Beg, who was the Agha of the Surgıcı tribe, but he betrayed them and wanted to take Kajje from him by killing Salih. At the end of the story, Salih died and Kajje committed suicide after that. The love story of Salih and Kajje is mainly built on five main characters: Salih, Kajje, Kajje's father, Emir of Palo and Hasan Beg the agha of the Surgıcı tribe. Although there are minor differences in the characters of the story between the various versions of the story, this doesn't spoil the plot and the skeleton of the story. Even Though this love story is based on oral sources, they correspond to a historical reality in terms of people and place names in the story. As a result of our study on historical sources, the real identities of some of the characters in this story partially reached. In the research we carried out, especially on the Emir of Palu and Hasan Beg Surgıcı various information were obtained in the Ottoman archives. According to this situation, the event took place in the second half of the 18th century. A person named Salih, who lived in Palo in this date range and was busy with the same work that Salih did in the story, was also encountered. Consistent with our estimations, Salih, whose name is mentioned in the archive records, and Salih, the main character of our story, are the same people.

Destpêk

Serhatîya “Salih û Kejê” bi navên wekî “Salihê Naso”, “Salihê Nasir Axa û Keja Gulîsor”, “Keja bûka Mîrê Palo û Salihê kurê Mîrê Berêz” û “Başoka Mîrê Palo” têtê nasîn. Ev serhatîya evîni li nav civata kurdan da gelek berbelav e. Di erdnîgarîyeke gelek firavan û deverên jêk dûr ev serhatî ji aliyê gelek dengbêjan ve hatîye gotin. Ji Barzan heta Efrîn û Çiyayê Kurmênc, ji Şengalê heta Serhedê vegêrana vê serhatîyê nîşana zêde belavbûna wê ye. Hindî ku em pê dizanîn ev serhatî li Efrîn û Çiyayê Kurmênc ji aliyê Reşîd Mem Çûçanê, ‘Elî Kabê, Hesên Nazî, Remzî Ehmed Çawûş, Mecîd Hemgulî û Menanî Fayîq, li derdorên Dîyarbekirê ji aliyê Evdilhadi Arzûnoğlu, Sidiq Karliova, Hesên Şilbê û Îbrahîmê Pîrikî, li Serhedê ji aliyê Şakiro, Zahiro û Hecî Adilê Sêndîlîyê, li Deşta Surûcê ji aliyê Baqî Xido, Ubeyt Altûn û Henîfê Minazê, li Bahdînan ji aliyê Nadir Zêtî Barzanî, Mihemed Pîro û Casim Şîkakî û li Êzidxanê jî ji aliyê Hemê Îsê Masekî, Se’îd Gabarî, Pîr Miço, Lezgîn Seydo û Celô Şingalî ve hatîye vegêran û di kasetan da hatîye tomar kirin. Piraniya van qeydan mirov dikare li ser You Tube peyda bike. Herwesa serhatîya Salih û Kejê wekî roman hem bi tirkî hem jî bi kurdî ji aliyê Sabri Akbel ve hatîye nivîsîn (Akbel, 2016; 2018).

Ji ber zêde belavbûna serhatîya Salih û Kejê bivê nevê varyantên ji aliyê naverokê ve jêk cuda derkeftine meydanê. Dengbêjên her devereke tiştêk lê zêde kirîye û ji ber vê çendê pir an kêm ferq û cudahî çêbûne. Lê belê ev ferq û cudahî taybetî di hûrgilîyên serhatîyê da dîyar dibin û ev çende zererê nagehîne binîşe û îskeletê serhatîyê. Çunkî her çend di varyantan da navên hinek leheng û cihan cuda bêne vegêran jî serûberê serhatîyê naguhore. Di vê serhatîyê da arîşeya serekî nebûna qeydên rêkûpêk ên vê serhatîyê ye. Qeydên berdest, ên devera Efrîn û Çiyayê Kurmênc û Serhedê têtê ne, yê din piranî kêmin û ev serhatî ji serî heta binî nehatîye qeydkirin. Ev çende berawirdkirina varyantan û derêxistina hemî hûrgilîyên varyantên cuda, zehmet diêxe. Lê belê sererayî van hemî kêmasîyan ev çende ji bo serwestbûna serûberê serhatîyê nabe asteng.

Deqa çapkirî ya serhatîya Salih û Kejê ji aliyê M. Dufresne ve li bajarê Sêrtê hatîye tomarkirin û bi navê “Un Conte Kurde De La Région De Sö’örd Transcrit Et Traduit” (Ji Devera Sêrtê Serhatîyeke Kurdî, Transkirîpsiyon û Werger) di sala 1910ê da li Journal Asiatique di rêza duyê, bergê 15an da hatîye weşandin. Wî, ev serhatî ji devê stranbêjekî Sêrtê wergirtîye û ev varyant bi Se’îd Efendîyê Hekarî ku ihtîmale li Sêrtê karmendê dewletê bû, daye nivîsîn (Dufresne, 1910: 107-117). Bi rastî her çend ev deqe bi çavê deqên devkî yê jorî behs kirî kurt be jî ji ber ku kevintirîn deqê qeydkirî ye gelek girîng e.

Di van salên dawîyê da li ser berhevkirin û nirxandina vegêranên dirêj ên menzûm/strankî yê edebîyata devkî ya kurdî da geşedanek peyda bûye. Di qada akademîk da jî li ser berhevkirin, tûjandin, vavartin, analîz û nirxandinên van vegêranan gelek xebat têtê kirin (Subaşî, 2023; Kaplan, 2022a; Tek, 2021; Sönmez, 2021). Lê belê munaqeşeyên derbarê pênasêkirin û navlêkirina cûreyên vegêranên dirêj ên menzûm û menzûm-peşan ên di folklorê kurdî, hêj di asta

destpêkê ne. Ev vegêrana mijara vê nivîsarê di nava xelkê sade da wekî çîrok, serhatî an jî stran/klama Salih û Kejê tête binavkirin. Mirov dikare cûreyên wekî destan û beytan jî lê zêde bike. Lê belê çîrok, serhatî û stran/klam cûreyên ji hev cuda ne. Li dû dîtina me serhatîya Salih û Kejê divê di bin kategoriya “vegêranên strankî” da bête qebûlkin (Kaplan, 2022b: 277-278, 281).

Di Jêderên Devkî da Serhatîya Salih û Kejê

Ji ber di erdnîgarîyeke berfireh da vegêrana serhatîya Salih û Kejê varyantên kêman zêde ji hev cuda peyda bûne. Deverên ji hev dûr, devokên cuda, çand û civakên jêk cihê, derbazbûna demî û şeweyên dengbêjan li ser peydabûna varyantên cuda tesîr kirîye. Ji bo analîzkirineke bi rêkûpêk me dil heye varyantên vegêrana vê serhatîyê li ser dever û hewzên çandî da dabeş bikin. Li dû varyantên devkî yê me peyda kirî em dikarî vê serhatîyê li ser şeş dever û hewzên çandî yê wekî Efrîn û Çiyayê Kurmênc, derdora Dîyarbekirê, Serhed, Deşta Surûcê, Bahdînan û Êzîdxane dabeş bikin. Di vê beşê da varyantên cuda dê bêne berawirdkirin û wekhevî û cudahîyên wan dê bêne destnîşankirin.

Di varyantên devera Efrîn û Çiyayê Kurmênc têne vegêran Salih kurê Ne’san Begê Mîrê Zirkan e. Wî, bi navê Fetîmê û Gewrê du xwîşk hene. Kejê jî keça Mîrê Palo Ferzê/Ferhoyê Uzeyr e. Salih di xortanîya xwe da bi îmkânê babê xwe ve perwerdeya zanistên wê demê yê ‘ilmî û leşkerî ditîne û mirovekî zana ye. Dema qewlê zewacê hatî bi keçên ‘eşîra xwe razî nabe û dixwaze li dinyayê bigere û keçeke henkûfê xwe peyda bike. Li dû varyantekê Salih ji ber ku xortekî şûm û muzir bû li cem babê wî gilîya wî hatîye kirin lewra ew ji ‘eşîra xwe derkeftîye û terke-dinya bûye (Nazî, 2018). Di varyantekê da jî Salihî di xewna xwe da Kejê dîtîye û qesta welatê wê kirîye (Çûçanî, 2012). Salih diçe bajarê Palo û di hewşa qonaxekê da Keja Gulîsor dibîne û lê aşiq dibe. Ew qonaxa Mîrê Ferho ye. Li wê qonaxê dibe mêvan. Dema mîr têt, Salih dibîne û pirsan lê dike. Salih dibêje ez mirovekî feqîr im û ji bo xwe karekî digirim. Mîr dibêje çi kar ji destê te têt. Ew jî dibêje heke tu bixwazî ez dê di dîwana te da qehwegerîyê bikim û mîr jî vê qebûl dike. Bi vî awayî li mala Kejê dimîne û ew herdû dil didin hevdu. Rojekê mîr pê dihesa ku Salih mirovekî xwenda û zana ye û paşî wî dike katib û tehsîldarê xwe. Salih ji bo tehsîlkirina bacên gundîyan li gundên mîr digere. Pismamekî Kejê heye bi navê Qadirê Axê û ew ji dotmama xwe hez dike. Lê belê her çend Kejê ji mamê xwe xwestibe jî mamê wî keça xwe nedayê. Ji ber vê çendê Qadirî komeke mişextan li dora xwe komkirine û neyarîya mamê xwe dike. Rojekê Qadir talana mamê xwe Mîrê Palo dibe. Kes newêre li dû talanî biçe. Salih dibêje mîrî heke muse’eda we hebe ez dixwazim talanê vegeerînim. Di varyantekê da daxwaza vegeandina talanê ji alîyê babê Kejê ve hatîye kirin û wî gotîye ku kî talanê vegeerîne, ez ê keça xwe bidimê. Salih diçe û bi mêranî talanê vedigêrîne. Lê belê mîr soza xwe bi cih naîne (Nazî, 2018).

Li ser vê çendê Salih Kejê direvîne û dibe nik Hesên Begê û xwe tavên bextê wî. Lê belê Hesên Begê bêbextîyê li wan dike û Salih diavêje zîndanê û Kejê ji wî distîne. Salih û Kejê derfetekê dibinin, xwe ji destên Hesên Begê xelas dikin û

diçin Çîyayê Hemdo, Geliyê Xiştanê. Wê derê bêhna xwe vedidin û radizên. Duwanzde an jî çil Siwarên Sûbirgucê yên mêrkujên Hesên Begê wan dibînin. Dema Salih pê dihesê, direve û Kejê tenê dihêle nav destên wan da. Li ser vê çendê Kejê hinek bendan diavêje li ser Salih û gilîyan jê dike. Kela mêranîyê xwe Salih dide û tê, yek tê ne, hemî siwaran dike, destê Kejê digire û dibe. Vê carê diçine cem Huseyîn Begê û xwe diavêjin bextê wî. Di hinek guhartoyan da Salih û Kejê diçine cem hinek kesên di belê kes wan nahewîne û dixwazin Kejê ji wî bistînin (Çûçanî, 2018; Nazî, 2012). Dema ku Huseyîn Beg dizane Kejê keça mîrê Palo yê dostê wî ye, ji penî ve cabê ji bo mîrê Palo dişîne ku bila bê Salih bikiye û keça xwe bibe. Mîrê Palo bi leşkerakî giran ve têt û di navbera leşkerî wî û Salih da şer çêdibe. Di vê navberê da babê Salihî ji vê çendê agahdar dibe û bi leşkerê xwe ve tete harîkarîya kurê xwe, wî ji mirinê xilas dike û daweta herduyan dike (Nazî, 2018; Çûçanî, 2012; Fayîq, 2022; Hemgulî, 2021; Çawûş, 2022).

Varyantên Deşta Surûcê mixabin bi çavê versiyonên Efrîn û Çîyayê Kurmênc nîvco û nivîşkan in û em derbarê aqibeta Salih û Kejê da serwest nabin. Li dû vegêrana Deşta Surûcê Salih axayê gundê Narsê ye. Her çend rasterast nahête behskirin jî mirov wisa têdigehe ku ew gund dikeve başûr an jî rojhilatê bajarê Rûhayê. Kejê jî keça Ferhoyê Mîr Uzeyrê malmezinekî Paloyê ye. Dom (mitirb) rojekê li Salih dibin mêvan û wesfên Kejê ji bo wî dibêjin. Wî, hêj Kejê nedîtî lê aşiq dibe û ev evîne wî nexweş dike. Wî, li ser çend hekîm û tebîban digerin lê belê çareya wî nabînin. Salih bi rêka Rûha, Sêwreg û Diyarbekrê xwe digehîne Paloyê. Diçe mala Ferhoyê Mîr Uzeyr û xwe wekî katibekî gelek zîrek dide nasîn. Li wê derê hem katibî hem jî tehsildarîya babê Kejê ya heftê û pênc gundan dike. Seh dike ku Kejê di qesra babê xwe da di tebeqa şeşan da dimîne û li pişt çardeh deran hatîye parastin. Salih diçe nik hedadekî û numûneyên heftê û pênc kilîlan çêdike û dixwaze biçe oda Kejê. Şevêkê penî ve bi wan kilîlan ve deran vedike û diçe oda Kejê. Ew û Kejê hevdu dibînin û xwe bi wê dide nasîn. Kejê dibêje wî, ez sozdayîya pismamê xwe Qadirê Axê me. Lê belê heke pismamê min bimire hîngê ez dê bi te bikim û nişanekê dide Salih. Di vê navberê da Mistefa Begê kurê mîrê Palo ji bedewîya Kejê agahdar dibe û tê wê ji babê wê dixwaze. Ferhoyê Mîr Uzeyr dibêje Mistefa Begê ku kurê Silêman begê birayê min Qadir Axa, Kejê xwestîye belê min nedaye wî. Ji ber vê çendê Qadir Axa bi sed û pêncî mişextan ve derkeftîye çîya. Heke Kejê bideme te ew dê bêt û min bikiye. Mistefa Beg guhê xwe nade wî û bi xurtî Kejê dibe qonaxa xwe ya Palo. Qadirê Axê ji bo standîna Kejê tete pêşîya mîrê Palo lê belê bi ser nakeve û ew tete kuştin. Dema mîr, Kejê dibe qonaxa xwe Kejê şîna pismamê xwe digire û nahêle Mistefa Beg bibe zava. Di alîyê di Ferhoyê Mîr gazî Salih dike û dibêje wî, keça min hate revandin û pismamê min jî hate kuştin. Heke tu bişêy Kejê xelas bike bila ji bo te helal bît û gustîra xwe jî wekî nişan dide Salih. Salih diçe qonaxa mîrê Palo û dibêje mîr, rizqê min hatîye vê derê. Kejê jî dibêje Mistefa Begê ku belê ew katib û wekilê babê min e û bila êdî cem me ‘eynî karî bike. Bi vî şikî Salih û Kejê dîsa digehin hevdu.

Rojekê Kejê dibêje mîrî heke izna te hebe ez dixwazim derkevim xasbexçe da bêhna min bêt. Lê belê ji ber ku ez li vê derê tenê Salihî dinasim bila ew jî digel min bêt. Mîr jî izna wan dide. Salih û Kejê pêkve derdikevin xasbexçe û tê da digerin. Paşî ji wê derê derdikevin û diçine pala çîya, bin dara zeytûnê rûdînin û herdû wê derê xew ra diçin. Dema mîr, wan xasbexçe nabîne li pey wan dikeve û di bin darê herdûyan pêkve razayî dibîne. Herdû ji dengî hişyar dibin û dema Salih meselê têdigehe direve. Mîr, Kejê dibe qonaxê, lê dide û paşî diavêje zîndanê. Salih di nivê şevê da dadikeve bajarî û diçe mala pîrekê. Dibêje pîrê here zîndanê û Kejê bi min bihesînê. Pîrê bi şiklekî diçe zîndanê û caba Salihî digehîne wê. Kejê dibêje heke Salih dê bişêt min ji zîndanê derxîne bila bêt. Lê heke nikare bila nehêt, ez qedera xwe razî me. Salih nivê şevê diçe zîndanê, Kejê jê dertîne û herdû pêkve direvin. Salih dibêje Kejê em dê biçin qeza Sûrgicî li cem Hesên Axa. Kejê dibêje wî heke tu min bibey cem wî, ew dê min ji te bistîne. Salihî guhdarîya wê nekir û çûne mala Hesên Axa. Dema çûne mala Hesên Axa û ew bi Kejê hesîya, dest û pîyên Salihî girêdan û xwest Kejê li xwe mahr bike. Di wextekî şevê Kejê û Salih fersendekê dibînin û direvin. Piştî qederekê çûyî Salih dibêje xewa min têt û divê ez bêhnekê razêm û herdû radikevin. Heftê û pênc sekmanên Surgicî yên li pey wan ketî, têt û wan dibînin. Dema Salih hişyar dibe û wan dibîne, direve û Kejê tete girtin. Kejê bi gotina çend bendan ve gazindeyan ji Salih dike û Salih jî têt û Kejê ji wan distîne û dîsa pêkve direvin (Altun, 2021; Minazê, 2020; Xido, 2020). Serhatî heta vê derê têt û mixabin ji ber nebûna qeydên varyantên Deşta Surûcê yên temam em aqibeta Salih û Kejê nizanîn.

Derbarê varyantên dewrûberên Dîyarbekirê çar jêderên me hene. Bi rastî dengbêj Sidiq Karliova her çend xelkê Serhedê be jî vegêrana wî gelek nêzîkî varyantên Dîyarbekirê ye. Lewra me ew êxiste di nav devera Dîyarbekirê. Di vê deverê da qeyda bingehîn a Ebdilhadî Arzûnoglou ye. Lê belê mixabin ev qeyd nivîşkan e û dawîya serhatîyê tê da nîne. Qeydên din ên vê deverê jî gelek kurt in. Li dû vegêrana Arzûnoglou, Salih mirovekî feqîr û bîyanî bû. Bi meqseda peydakirina karekî hatîye Palo û di wê derê bi tesadûfen Kejê li pencera qonaxekê da ditîye. Kejê keça Mihemed Begê yek ji malmezînan Palo ye (Arzûnoglou, 2018). Li dû jêderên dî Salih xelkê Silîvan e û mirovekî axa ye. Wî navûdengê Kejê bihîstîye û ji bo dîtina wê tebdîlî qîyafet kirîye û hatîye Palo. Kejê keça Ferhan Begê ye (Karliova, 2017; Şilbê, 2021; Pîrikî, 2022). Salih heft salan li nava qonaxa babê Kejê wekî qehweger xebitîye. Wî û Kejê her çend dil hevdu hebe jî şerm kirine evîna xwe eşkera bikin. Rojekê kurê mîrê Palo tê û Kejê ji babê wê dixwaze û di demeke kurt da daweta xwe dike û Kejê dibe qonaxa xwe. Tenê Arzûnoglou dîyar dike ku navê kurê mîrê Palo Ehmed Begê kurê Heyder Begê ye. Piştî Kejê ji qonaxê diçe êdî sebr û sukûna Salih nahêt û xatra xwe ji Ferhan Begê dixwaze û ji cem wî diçe. Salih dixwaze Kejê cara dawî bibîne, eşqa xwe jê ra bibêje û xatra xwe jê bixwaze û biçê. Bi vê nîyetê tete mala Kejê ya nû. Lê belê Kejê û mîrê xwe israr dikin ku neçe û bibe seyîsê (celebdarê) Ehmed Begê. Salih li fersendekê digere ku halê xwe bo Kejê bejê, kula dile xwe der bike û biçê. Îro sibe tam sê sal ser ra derbaz dibin ku wî hêj derdê xwe ji Kejê ra negotî. Şevêkê

Kejê radibe nimêja sibê. Dema ew li ser nimêjê Salih bi bendên stiranê ve derdê xwe ji bo Kejê dibêje û paşê Kejê jî lê vedigerîne (Arzûnoglou, 2018). Di vê navberê da kurê mîrê Palo pê dihesa. Salih direve. Kurê mîrî Kejê digire, dikute û paşî diavêje zîndanê. Paşê Salih rêyekê peyda dike, Kejê ji zîndanê dertîne û herdû pêkve direvin û diçin cem Hesen Paşayê Çermûkê. Hesen Paşa li Kejê aşiq dibe û wê ji Salih distîne û wî jî diavêje zîndanê. Salih dibêje wî, tu mirovekî paşa yî, ev kiriyare kêr te nahêt. Tu destên min berde, Kejê bide min. Em dê derkevin û biçin. Paşê tu siwarên xwe rêke li pey me, bila bên bi mêranî min bikujin, çingilê Kejê bigirin û paşê bila wê ji bo te bînin. Paşa jî vê gotinê qebûl dike. Salih û Kejê berdidin û paşê siwarên paşa li dû wan dikevin. Dema siwar nêzî wan dibin Salih direve û ew jî Kejê digirin. Kejê çend bendan diavêje li ser Salih û ew jî paş ve vedigere, wan siwaran dukuje, Kejê jê distîne û dîsa didin rê. Vê carê diçin cem axayekî din. Ew axa jî çavê xwe berdide Kejê. Mecbûren ji wê derê jî direvin û diçin mala Mihemed Begê Silîvanî. Ew jî çavê xwe berdide Kejê, Salihî dukuje. Dema Kejê vê dizane ew jî xwe dukuje (Karliova, 2017; Şilbê, 2021; Pîrikî, 2022).

Ji devera Bahdînan tenê varyanteke dengbêj Nadir Zêtî Barzanî ya vê serhatîyê heye. Ev varyant dirêj e belê mixabin dawîya serhatîyê tê da nîne. Li dû vê varyantê Salih mirovekî êtîm û feqîr bû, li nav qonaxa mîrê Palo mezin bûbû û karê qehwegêrîyê dikir. Mîrê Palo sê kur hebûn bi navê Hesen, Ehmed û Muhsîn. Kejê jina Hesenî bû. Rojekê hinek dengbêj dibin mêvanên dîwana mîrî û stranan dibêjin. Ev dengbêj ji mîrî dixwazin ku dengbêjekî wî jî stiranê bibêje. Lê belê mîrê Palo çî dengbêjên wisa nînin ku berberîya wan dengbêjan bike. Li ser vê çendê Salih destê xwe dibe bin guhê xwe û qîr dike stranan. Bi vî şiklî dengbêjbûna Salih dîyar dibe. Kejê li herêma qonaxê hay ji dengê wî dibe, piştî şevbêrkê wî dixwaze nik xwe û nasyarîya wan dest pê dike. Hêdî hêdî herdû li hevdu aşiq dibin. Xulamekî mîrî bi navê Qurmo evîna wan dihesa û ji mîrî ra eşkera dike. Mîr biryara kuştina Salih dide. Dema Salih evê dizane berî ku ew wî bikujin, ew her sê lawên mîrê Palo dukuje, destê Kejê digire û diçin cem Hesen Axayê Malkokî. Hesen Axa bêbextîyê li wan dike. Ew ji ber wî direvin diçin cem Silêman Begê Zîla. Paşê ji cem wî jî derdikevin û diçin Geliyê Şaqîstanê. Zelamên Hesen Axa wê derê digehin wan. Salih berê direve paşê ji ber tanên Kejê vedigere û wan zelaman dukuje. Dawîyê direvin diçin nav mala Huseyn Axayê mîrê Êzîdîyan. Huseyn Axa wan dihawîne û mahra wan dike. Di wê demê da leşkerê mîrê Palo digehe wan. Lê mîrê Êzîdîyan wan teslîmî mîrê Palo nake û bi leşkerê xwe ve şerê wan dike. Di vî şerî da çar lawên mîrê Êzîdîyan têne kuştinê (Zêtî, 2021). Mixabin di vê derê da qeyda dengî xelas dibe.

Varyantên Serhedê hem ji alîyê naverokê hem jî ji alîyê ruxsarî ve ji yên dî cudatir in. Ji alîyê ruxsarî ve bi rêzebendên nijandî ve hatîne vehandin û vegêrana xeberkî qet tê da nîne. Li dû varyantên Serhedê Salih kurê Mîrê Berêz e. Şevêkê Keja keça mîrê Palo xewna xwe da dibîne û dema hişyar dibe ji babê xwe dixwaze ku keça mîrê Palo jê ra bixwaze. Babê wî dibêje barê mîrê Palo giran e, min pê çênabe ji erdî hilînim û daxwaza kurê xwe bi cih naîne. Li ser vê çendê Salih dibêje ez bi xwe dê daxwaza xwe bi cih bînim û diçe bajarê Palo. Wê derê li

mala pîrekê dibe mêvan, bi şiklekî xwe digehîne Kejê, wê qanîh dike û pêş çavên mîrî, Kejê direvîne. Dema revandinê da sê guleyan jî li ser konê mîrê Palo da diavêje. Salih dibêje Kejê heta ez te digehînim mala babê xwe min divêt axa û begên dikevin li ser rêya me biceribînim, kanê bextê wan çawan e. Kejê her çend vê qebûl neke jî çar naçar bi ya Salih dike. Berê diçin nav ‘êla Hesên Begê Zengûzêrî. Hesên Beg dixwaze Kejê ji Salih bistîne. Salih û Kejê têne pala Qiliçdaxê û konê xwe vedidin. Hesên Beg bi leşkerê xwe ve têtê li ser wan lê belê Salih wan hemîyan dikuje û paşê berê xwe didin ‘êla Mihemed Begê. Mihemed Beg wan dihewîne û wan digehîne mala babê Salih. Bi vî awayî herdû bi mirada xwe şa dibin (Şakîro, 2020; Zahîro, 2020; Sêndîlîyê, 2020).

Varyantên dengbêjên Êzîdîyan mixabin kurt in û hema tenê ji hinek bendên dîyalogê yên di navbera Salih û Kejê pêk tên. Bi rastî Se’îd Gabarî behsê varyanteke dengbêj Hemê Îsê Masekî dike û wê wekî rêkûpêktirîn varyanta vê serhatîyê qebûl dike. Mixabin ji ber ku me ew varyant bi dest neexist hema tenê bi hêvîya jêgotinên Gabarî ve man. Tiştê ji vê varyantê em dizanin ewe ku Kejê bûka mîrê Palo ye, Salih wê direvîne tîne qeza Sûrgîçîyan nav mala Hesên Begê. Dema Hesên Beg dixwaze bêbextîyê li wan bike ji ber wî direvin. Di rê da marek li Salih vedide û ew dimire. Keja bêxweyî û bêxudan jî direve diçe Birîvan li nav mala ‘Elîyê ‘Emo (Gabarî, 2020). Dengbêjên din jî hema hinek bendên dîyalogê vedigêrin (Miço, 2022; Seydo û Şingalî, 2012; Pîro û Şîkakî).

Pêşkêşkirin û Herfgehêzîya Deqê Kejê û Salo yê M. Dufresne

424

M. Dufresne di pêşgotina xwe da devera Sêrtê dide nasîn. Li dû vegotina wî nufûsa Sêrtê ji 14,000 kesan pêk tê. Li Sêrtê zimanên torî, ermenîkî, suryanîkî, ‘erebî tê axiftin û kurdî wekî zimanê hevpar e. Li wê derê her çend devoka Botan bê axiftin jî di bilêvkirina Sêrtê da guvaş (stress) kêmtir e. Li dû gotina Dufresne dema ev metne dihat berhevkirin gelek hişyarî li nivîsîna dengan hatîye kirin. Piştî ev serhatî bi tîpên latînî hatîye nivîsîn, li pêş sê kesan hatîye xwendin. Du kesên ji wan xwendina tîpên latînî dizanîn û evan dikarî metna latînî serrast bixwînin. Berhevkar heta bi bilêvkirinê qayîl bûyî karê xwendinê hatîye dubarekirin (Dufresne, 1910: 107-108). Dufresne piştî latînzekirina metnê wergera wê ya frensî jî lê zêde kirîye (Dufresne, 1910: 113-117). Metnê resen yê çapkîrî di servehî lê da ye.

Deqê M. Dufresne: Kejê û Salo

Kejê xwestîya Mîrê Paloyê bû. Salo dilê wî ketibû li Kejê û Kejê jî Salo diviyabû. Dilê wan hevdû ketibû. Rojek hev dîtin qewlê wan kirin. Kejê vê êvarê wê here gundek dî û Salo serê sibê wê here bigêje Kejê û herin bi dinê ve. Çira li wî gundî? Ji tîrsa Mîr nedikarin şixula wan bikin: Yanî hev û dû bistînin.

Serê sibê Salo çû wî gundî, bi hev ra derketin, destê hev û dû girtin û bi rê ve çûn. Wê gavê du birayê Kejê hebû; yek ‘Ebo, yek Bekir bûn. [Pê] hesîyan: pênc pismamê wan hebû. Pey Salo û Kejê ketin. Gîştin Salo û Kejê. Gazî Salo kirin, eve

em hatin pey te bêbext em ê te bikujin. Salo dest da şûrê zirav, çû serê her heftan jê kir.

'Ebo, Bekir; 'Ebo, Bekir.

Salo tu şêrîn î nola şekir

Vê êvarê eve li me rabûn

Berê xwe dane korta gîdîya qoce Dîyarbekir.

Çûn Dîyarbekir. Li wê derê jî keskî newêrî me'ra Kejê û Salo bikira, ji tirsra Mîrê Paloyê. Kejê jinekî bedew bû, li kû der diçûbû xelk çavê xwe didabûn Kejê. Li Dîyarbekir jî îpsîz hebû, çav dan Kejê. Kejê jî bi hîleyê wan hesîya. Gote li Salo, rabe, em ê ji vî bajarî biçin. Nexwe divên ku te bikujin û min ji xwe ra bibin.

Kejê serê min bi gorîyo, Dîyarbekir çendî pahn e

Tê digerin 'eskeran û romîyan û zabîtan û nezam û qewasan.

Vê êvarê eve li me rabûne, berê xwe dene Kerxan û Kîkane.

De lê lê Kejê cîgera dilê Salo.

Çûne Kerxan û Kîkan. Çûn gundekî navê wî 'Awêna² bû. Nê Kejê jineke bedew e: me'lûm e li kû der diçûn çav didabûn Kejê. Salo jî, li hazira zêde nekim, lawkî baş bû, serhatî bû. Li vî gundî jî şêwra xwe kirin, gotin: em ê Salo bikujin û Kejê jê bistînin. Hindek gotin: li nava gund em bikujin ne munasîb e. Bila ji gund derkevin, bila çar zelamek li pey bikevin, Salo bikujin û Kejê vegirin bînin. Û ser vê qewlê sekinîn. Kejê bi hîleya wan hesîya. Jê ra hal û hewalê gundîyan qîset kir. Taşta wan anîn, nîv xwarin yan nexwarin û rabûn rê.

Saetekê ji wî gundî dîr bûn, çar zelum li pey wan ketin. Sê çar tifeng bi wan teqandin. Salo tirsîya saw lê ket. Çûne Kejê, girtin, ji Salo anîn. Nê Kejê jinek bedew e, dema xeber bida keyfa wan her çar zelaman dihat. Kejê bi Salo zehf dişewitî û wisan bawerîya wê heye li kû der biketa cîyê tengîyê wê wî xilas bikira. Û paşî tiştê jê derneket û maye li wê sekinî. Kejê gote wan çar zelama: belkî Xudê min nekiribû qismeta Salo, belkî Xudê kiribû qismeta yek ji wan her çaran. Hun izna min bidin yek kilamek li Salo bêjim. Yek ji wan go: nehêlin xeberek li Salo bêjît: Her sê mayî gotin bêje, em çar in, ew yek e, bê, em serê wî bavêjin.

Kejê go Salo serê min bi gorîyo, Newala Baqîstana³ şewitî bi gez û bî ye

Çar peyayê 'Awênî ji wê ve tîn bi hêdîye

Salo 'ecêb û 'ecêb Kejê ji Salo standîye

² Gundek e li bakûrê Mêrdînê ku merkeza Sûrgîcîyan e.

³ Newalek e dikeve başûrê gundê 'Awêna.

Dîsan Salo ew Salo ye, rehnek[?] pey nekirîye. Carek dî Kejê gote wan her çar zelama: hûnê iznekê bidine min, ez ê xeberek dî lê bejim. Ewê qerpoz gote wan nehêlin bêjît. Ew⁴ wê bê me bikujît û Kejê bibe. Her sê mayîn izin dane. Gotin Kejê bêje, wê çi bikira bike.

Kejê go Salo serê min bi gorî, Newala Baqîstana şewitî bi dar saqoq e⁵

Çar peyayê 'Awênî ji wê ve tîn bi gorê loqe

Yek Hesên yek Beko ye, yek çaroq e, êdî simbêl boq e

Dîsan Salo ew Salo ye, qet nelebitî û Kejê dilê wê zehf pê dişewitî. Kejê jî jineke bedew e dema bi wan xeber dida zehf pê şa dibûn. Gote wan: hun ê iznekê bidine min kilamek dî lê bêjim. Dîsan ewê qerpoz qebûl nekir. Her sê zelamê dî gotin Kejê bêje.

Kejê go Salo serê min bi gorî, hîn e sed car bi min hîn e

Tu rabe enîşka xwe li qewkebê mertalê xe, rîşîya li bejna zirav wergêrîne

Salo te digo ez ê Keja xwe birevînim bibim mala qol Şemdîne

Kejê go Salo serê min bi gorî, te digo ez Salo me Saloyê bila dîn im

Xweyê şûrê zirav Şamî şîxenî devê şîn [im]

Te digo ez ê Keja xwe ji nav gawir û 'ecema bi şûrê zirav bidêrînim

Ji vî xeberî mûyê Salo rabû wey şûjin bi kiras û hemî cilê wî derket. Û ew her çar zelam û Kejê nêzîkî gund bûbûn. Yek evraz mabû li ber gund. Carek dî izin ji wan xwest û got.

Kejê got Salih çav di reş î çav belek î

Xweyê mertalê şor bi xelek î

Wekî ji te nedihat çira te destê min da birî[n] ji birca belek û bab û kekî

Salo dest da şûrê zirav û baz da. Çû serê sisê ji wan jê kir û ewê qerpoz seqet kir û gote wî here bêje mezin û maqûlê gundê awa: Evên ku rêkirîn têra qeretûna min nekirin. Bila têra taştîkê ji min ra rêkin. Salo destê Kejê girt, çûn li serê gund û gazî li wan kir. Got: werin, gali sari mire awan.⁶ Hin gotin em ê herin pey wî, hin dî gotin welleh em nikarin wî. Elbet ew mêrê ku ev jin revandîye, hêvî ji xwe heyê, mêrekî baş e, serhatî ye. Bû şev li ser wan.

Salo go ho ye sed car bi min ho ye

⁴ Ev der di metnê çapkirî da vala bû.

⁵ Dara kezwanê.

⁶ Ev hevok bi diristî nehate xwendinê.

Dar û derî li me civîyan, sor çilo ye

Ez ê destê Keja xwa bigirim, bibim cem Mîrê Paloye

Bû şev, bi rê da çûn heta bû sibe li ser wan. Gundek rastî wan hat, bi wî gundî çûn. Dergeyek mezin li ber wan hat. Ew derge xaniyê mala axa bû. Pişt derge du dêk hebûn. Kejê alîyek rûnişt û Salo alîyek rûnişt. Axa ji jor hat, biçî destavê mesîn bi dest. Dît Salo û Kejê li wê derê rûniştine. Ji wan pirs kir: hun bi çi şixul hatine liha. Ji serî heta paşî qiset kir û gotin jê ra. Me qesta Xudê û te kirîye. Wê saetê Mîr gazî qerwaş û xulama kir. Gote qerwaş: Kejê bibe nav pîreka û Salo bibe dîwanê. Mîr çû destava xwe kir û hat li dîwanê û go welleh ez ê îro nikâha wan bikim.

Gazî Xoxo bikin, gazî Lolo bikin

Bila Xoxo bi def lêxe û bila Lolo li zirnê xe

Û gazî mela bikin bila mehra Salo û Kejê bi hev bixe (Dufresne, 1910: 109-113)

Berawirdkirina Varyantên Devkî û Deqa Çapkirî

Di vê beşê da ji bo baştir têgehiştina serûberê serhatîya Salih û Kejê, ev serhatî ji aliyê karekter û rêzerûdanan ve tete analîzkirin û berawirdkirin. Lê belê ji ber ku metnekî tekûz yê vê serhatîyê nîne û di her varyanteke cuda da hûrgilîyên cihê hene behsê hemî karakter û epîzodan bi berfirehî nahêt kirin. Zêdebarî dê li ser hêmanên hevpar bête rawestan.

Leheng

Di vegêranên devkî da leheng an jî karekter hêmanekî serekî ye. Karekter çî xeyalî an jî çî rasteqînî bin rûdan li ser wan tete avakirin. Nasîna karekteran ji bo têgehiştina rêzerûdan û serûberê vegêranê zor muhîm e. Em di vê xebatê da li ser hemî karekteran nasekinî tenê dê li ser lehengên serekî yên wekî Salih, Kejê, mîrê Palo û Hesên Begê rawestî.

Di hemî varyantên devkî û ya çapkirî da lehengê sereke Salih e û navê wî di çî varyantan da naguhore. Lê belê di agahîyên derbarê statûya wî ya civakî û karê wî da neqlên cuda hene. Piraniya varyantan da wekî kurê Ne'san Begê Mîrê Zirkan, kurê Mîrê Berêz, axayê gundê Narsê an jî axazadeyekî devera Silîvan tete pênasekirin. Di van vegêranan da her çend derheqê navê babê wî an jî devera wî da hevgirtinek nebe jî tiştê hevpar ew e ku Salih mirovekî 'esilzade ye. Varyantên mayî an Salihî wekî mirovekî feqîr û ji rêzê (Zêti, 2021; Arzûnoglû, 2018) didin nasîn an jî bêdeng dimînin (Gabarî, 2020; Seydo û Şingalî, 2012). Agahîyên derbarê karên Salihî bi statûya wî ya civakî ve hatine girêdan. Varyantên Salihî wekî mirovekî 'esilzade didin nasîn, her çend wî bi karên qehwegerî, katib, tehsîldarî û seyîsiyê ve wesif bikin jî li dû van vegêranan evana karên wî yên 'eslî nîne. Salih ji bo ku xwe baştir bigehîne Kejê bi qestî ew kar kirine. Lê belê varyantên Salihî wekî kesekî ji rêzê nişan didin, wî wekî qehwegêr û navmalîyekî êmin wesif dikin. Di van varyantan da tekane varyanta Salihî wekî mirovekî

dengbêj dide nasîn balkêş e (Zêtî, 2021). Di varyanta Dufresne da ji bo danasîna Salih çî agahî nehatine danê. Sererayî van cudahîyan di hemî varyantan da Salih wekî mirovekî berketî, jêhatî, zîrek û mêrçak hatîye pênasekirin. Tekane wesfa wî ya xerab xemsarîya wî ye ku guhdarîya Kejê nake û bê tedbîr hereket dike.

Lehenga duyê Kejê tenê di varyantekê da wekî Başok tête nasandin (Sêndîlîyê, 2020). Di piranîya varyantan da Kejê keça Ferzê/Ferhoyê Uzeyr e. Lê belê di varyanta Arzûnoğlu da ew keça Mihemed Beg e. Varyanta Zêtî di vê barê da çî agahîyan nade û Kejê tenê wekî bûka Mîrê Palo dide nasîn. Lê belê derbarê nasandina babê Kejê da arîşeyek mezin heye. Li dû vegêrana varyantên Efrîn û Çiyayê Kurmênc babê Kejê Ferzê/Ferhoyê Uzeyr mîrê Paloyê bi xwe ye. Varyantên Serhedê bêyî ku navê babê Kejê dîyar bikin wê wekî keça mîrê Paloyê didin nasîn. Beramberî vê çendê varyantên din ên babê Kejê wekî Ferzê/Ferhoyê Uzeyr qebûl dikin, wî wekî malmezinekî Paloyê didin nasîn, ne ku wekî mîrê Paloyê. Wekî dîyar Kejê di hinek varyantan da wekî keçeke nezewicî ya mîrê Palo û di hinek varyantan da jî wekî keça malmezinekî Palo û bûka mîrê Palo tête saloxdan. Di varyantên Kejê wekî bûka mîrê Palo didin nasîn da derbarê mîrê Palo û kurê wî yanî mîrê Kejê da agahî gelek kêma in. Tenê Arzûnoglû navê mîrê Palo tîne ku Heyder Beg e. Navê mîrê Kejê di varyanta Arzûnoglû da Ehmed Beg, a Altûn da Mistefa Beg û ya Zêtî da Hesên e. Agahîyên di varyanta Dufresne ji varyantên din hemîyan cudatir e. Li dû vê varyantê Kejê xwestîya mîrê Paloyê ye. Behsê babê Kejê tê da nebe jî behsê bira û pismamên Kejê dike. Wesa dîyar e ku di vê varyantê da Kejê hêj neveguhastî mala mîrê Palo, xwe digel Salih daye revandinê. Lewra bira û pismamên wê li pey wan herdûyan tên.

Di serhatîya Salih û Kejê da karakterê sembola xerabî û bêbextîyê Hesên Beg e. Hema hema di hemî varyantan da navê Hesên Begê/Axayî/Paşayî heye. Hesên Beg di varyantan da wekî Hesên Axayê Sûrgicî (Altûn, 2021), Hesên Paşayê Çermûkê (Karliova, 2017; Şilbê, 2021; Pîrikî, 2022) û Hesên Axayê Malkokî (Zêtî, 2021) tête nasandin. Varyantên din ên behsê Hesên Begê dikin jî bi şiklekî wî bi qeza, ‘êl an jî erdnîgarîya Sûrgicîyê ve girê didin. Hemî varyant li ser rola wî ya neyînî mutefiq in ku Salih û Kejê xwe avêtine nav mala wî û wî bêbextî li wan kirîye. Her çend di varyanta Dufresne da navê Hesên Begê derbaz nebe jî bi eşkerayî dîyar e ku devera Salih û Kejê revînê Awêna û Baqîstan du gundên serekî yên devera Sûrgicîyan in.

Rêzerûdan

Serhatî û vegêranên gelêrî ji rûdan û epîzodan ve li ser hev têne nijandin û rêzerûdan helqe helqe pêkve têne risandin û bi hev ra têne girêdan. Varyantên berdest ên serhatîya Salih û Kejê ji aliyê rêzerûdanan ve hindik jî be ji hev cihê ne. Ji ber nebûna metnekî tekûz a vê serhatîyê mirov nikare varyanteke ji vana wekî varyanta bingehîn qebûl bike. Lê belê cudabûna varyantên berdest û nivcobûna qeydan ji bo tesbîtîkirina epîzodên serhatîyê nabe asteng. Sererayî nebûna varyanteke bingehîn, ev varyantên ji hev cuda bi rastî hevdu tamam dikin û îmkana dariştina temamiya rêzerûdanên serhatîyê didin. Bi rastî ji ber nivcobûna

piranîya qeydên serhatîya Salih û Kejë mirov derbarê epîzod û rûdanên hinek varyantan da serwext nabe. Herwesa di rêza rûdanên serhatîyê û çawanîya wan da jî di navbera varyantên berdest da ferqên biçûk hene. Lê belê wekî me îfade kirî ev arîşene ji bo dariştina rêzerûdanên serhatîyê nabin asteng. Li dû analîza me serhatîya Salih û Kejë li ser van epîzodên bingeîn hatîye vehandin:

- 1- Danasîna Salih û Kejë
- 2- Çûna Salih bo Palo
- 3- Çavpêketina Salih û Kejë
- 4- Salih di nav mala babê Kejë da
- 5- Xwestin û veguhastina Kejë ji alîyê kurê mîrê Palo ve
- 6- Salih di nav mala mêrê Kejë da
- 7- Ji alîyê Salihî ve eşkerakirina evînê ji bo Kejë
- 8- Serdagirtina kurê mîrê Palo, revîna Salih û zîndanîkirina Kejë
- 9- Ji alîyê Salihî ve xelaskirina Kejë ji zîndanê
- 10- Revîna Salihî û Kejë
- 11- Di rêya revê da tûşî bêbextîyan hatin
- 12- Bi tenê hiştina Kejë di destê neyaran da û revîna Salihî
- 13- Pêgotina Kejë û vegeerîna Salihî
- 14- Şerê Salih û mîrê Palo
- 15- Encam

Di vegêranan da epîzoda serekî danasîn û hevnasîya lehengên sereke ye. Hemî varyantên serhatîya Salih û Kejë bi şiklekî danasîna karekterên serekî ve dest pê dikin. Di navbera varyantan da tiştê ku dibê sebebê arîşe û guhorîna gîvilê serhatîyê nasnameya babê Kejë ye. Çunkî di varyantên Efrîn-Çîyayê Kurmênc û Serhedê Kejë wekî keça mîrê Palo û di varyantên din da wekî keça malmezînekî Palo û bûk an jî xwestîya mîrê Palo tête pênasekirin. Lewra epîzodên 5, 6, 8 û 9an di varyantên Efrîn û Çîyayê Kurmênc da bi awayekî cuda li nava epîzoda 4ê da hatine belavkirin. Lê belê ev epîzod di varyantên Serhedê da bi awayekî eşkera cih nagirin.

Di varyantan da derbarê pêhesîna Salih a bi Kejë da sê motîf hatine bikarînan: Xewn, bihîstina navûdengê Kejë û tesadûf. Li dû varyantên Çûcanî, Şakiro, Zahîro û Sêndîlîyê Salih di xewna xwe da Kejë dîtîye, lê aşîq bûye û qesta welatê wê kirîye. Wekî dîyar varyantên hevnasîya herdû karekterên sereke li ser motîfa xewnê ava dikin piranî yên Serhedê ne. Di varyantên ji alîyê Altûn, Karliova, Şilbê û Pîrikî ve hatine vegêran da hevnasîya herdû karekterên sereke li

ser motîfa belavbûna navûdengê ciwanî û bedewîya Kejê ve hatîye avakirin. Lê belê çawanîya ji aliyê Salihî ve bihîstina navûdengê bedewîya Kejê, tenê di varyanta Altûn da bi berfirehî hatîye behskirin. Li dû vê varyantê domên/qereçiyên gerok behsê ciwanîya Kejê ji bo Salihî kirine û bi vî şiklî Salih ji wê haydar bûye. Varyantên derdora Dîyarbekirê her çend piştbestiyê bi motîfa bihîstina navûdengî bikin jî bi berfirehî behsê çawanîya wê nakin. Li dû varyantên Nazî, Fayiq, Hemgulî, Çawûş Arzûnoglû û Zêtî hevnaşîya Salih û Kejê bi tesadûfî çêbûye. Di varyantên Fayiq, Hemgulî, Çawûş da têtê vegêran ku Salih bi mebesta peydakirina keçeke henkûfa xwe terke dînya bûye, paşê Kejê dîtîye û hevnaşîya wan çêbûye. Ji ber vê çendê mirov dikare varyantên Nazî, Arzûnoglû û Zêtî yên ku hevnaşiyê bi temamî li ser tesadûfê ava dikin û van varyantan ji hev cuda bike.

Derbarê eşkerabûna hestên evînê yên karekterên sereke da piranîya varyantan wisa dîyar dikin ku berê Salih li Kejê aşiq bûye. Lê belê varyanta Zêtî berevajî vê çendê wisa dide xuyakirin ku berê Kejê hejêkirina xwe eşkera kirîye û paşê Salih jî pê qayil bûye. Derbarê çawanîya evîna herdu karekterên sereke da vegêrana Altûn gelek balkêş e. Li dû vê varyantê Salih her çend hêj berî çavpêketina Kejê bi awayekî yekalî li wê aşiq bibe jî, Kejê hîngê ji pismamê xwe Qadirê Axê hez dikir. Lê belê piştî ku pismamê wê ji aliyê mîrî ve hatîye kuştin, wê dil daye Salih û xwe digel wî daye revandin. Varyantên derdora Dîyarbekirê û yên Êzîdxanê jî evîna di navbera Salih û Kejê di destpêkê da wekî evîneke platonîk wesif dikin. Dema Salih li nav mala babê Kejê da wekî qehwegêr, katib an jî tehsîldar kar dikir, ew û Kejê li hevdu aşiq dibin, lê belê hestên xwe ji bo hevdu eşkera nakin. Piştî ku Kejê ji aliyê kurê mîrê Palo ve hatîye xwestin û veguhastin, êdî bê Kejê sebra Salih nehatîye û qesta mala Kejê ya nû kirîye. Lê belê li wê derê jî evîna xwe eşkera nekirîye, heta ku êdî sebr û taqeta wî nemayî. Varyantên Dîyarbekirê ji bo dema eşkerakirina evîna Salihî motîfa nimêjê bi kar tînin. Dema Kejê li ser nimêja sibê, Salih bi strankî evîna xwe tîne ziman. Kejê gilî û gazindeyan ji wî dike û dibêje ma heta niha kulîyan zimanê te xwaribû te evîna xwe hinde direngî eşkera kir. Lê di varyantên Êzîdxanê da Salih dema ew û Kejê li ser dîwarên birka qesra mîrê Palo rûniştî, evîna xwe eşkera dike. Di herdu varyantan da ev çend wiha têtê îfadekirin.

Kejê digo Saliho lê lê agir malê keto, Palo bişewite ha ho lo bi çem û kanî

Ew heft sal e tu mala bavê min xortî xulam bûy, ez qîz bûm, ez û tu xasbexçê Palo gelek caran bi hevdu ra gezmax û geryanê lawo tereso lê lê malmîrato bi qîzi law bi xortanî

Kilîdê maxazê 'erebi bi devê te nekeftibû, kulîyan serê zimanê te nexwaribû, te çima rokê va gotina xwe ji min ra nedigo, ez îro jina bi mehr û mêr im, piştî sê sala îro hîna te li li bîr anî (Arzûnoglû, 2018)

Kejê dibê Saliho mala bavê nexirabo rast e qesra kurê mîrê Palo bilind e, çi mezin e

Ez û Salihê xwe yê li ser dîwarê birkê li nav darêd gulan û sêvan, baxan û bîstanan rûniştine

Min çîmê kalegewrê bozê deqandî berdane heta ferşê mermerê bine

Te heft salan xulamtiya mala bavê min Silê Ferho kir û çar salan koletiya vi kopekê mêrê min kir

Mal xirabo tilya min di çavê te re neçûbû, kulyan zimanê te nexwaribû, rojekê gotineka eşq û evînê negot mine

Salih malmîrato ez jî hej bejna û bala Salihê xwe kekê Gewrê û Fatê dikim, ez niha dikarim ramûsanekê ji xanûmanêd gerdenê, ji teqna çavê rastê, ji boxaza qirikê cihê hellan û mercan û morîyan bi Salihê xwe dim, îcar Salih malmîrato tu yê herî li nava cadde û zikakê gundê Palo û tu dê bêjî xort û cahil û naşîyan re Keja Silê Ferho bûka Mîrê Palo soz û qerar lê dosta min e (Gabaî, 2020)

Di varyantan da di navbera epîzoda 4ê û epîzodên 8 û 9an da cîguhoriina hinek rûdan û motîfan xuya dike. Di varyanta Altûnî da dema behsê oda Kejê ya qesra babê wê têtê kirin, ew ode di tebeqa şeşan û paş çardeh deran wekî cihekî gelek asê têtê wesifkirin. Salih ji bo ku bigehe oda Kejê li cem hedadekî heftê û pênc numûneyên kilîlan dide çêkirin û paşê dikare xwe bigehîne Kejê. Beramberî vê çendê di varyantên Dîyarbekirê da ev odeya asê teqabulî zîndanê dike. Piştî ku kurê mîrê Palo pê dihesse ku Kejê û Salih ji hevdu hez dikin, Kejê diavêje zîndanê. Salih ji bo xelaskirina Kejê diçe cem hevalekî xwe yê hedad û kilîlan dide çêkirin û bi wan kilîlan ve derê zîndanê vedike û Kejê xelas dike. Motîfên ode û zîndan her çend ji hevdu cuda bin jî motîfa dergeh û kilîlan di herdu varyantan da hevpar e. Varyantên Efrîn-Çiyayê Kurmênc û Serhedê ji ber ku Kejê wekî keça mîrê Palo didin nasîn bi yekcarî behsê van rûdan û motîfan nakin. Di varyantên Dîyarbekirê da serdagirtina mîrî ya Salih û Kejê, revîna Salih û bi tenê hiştina Kejê, zîndanîkirina Kejê û hewlên Salihî yên ji bo îqnakirina Kejê ji bo derxistina wê ji zîndanê û revînê bi strankî têtê vegotin. Herwesa di varyantên Êzîdxanê da zimnen jî be mirov têtê digehe ku mîrê Palo carekê bi ser Salih û Kejê da girtîye û Salih revîyaye. Lewra dema ku Salih evîna xwe ji bo Kejê eşkera dike û ji Kejê dixwaze ku bi hev ra birevin, Kejê revîna Salih tîne bîra wî û ditirse ku ew dîsa wê di nîva rê da bihêle.

Di varyantan da bikarînan motîfa pîrê jî balkêş e. Li dû varyanta Altûnî dema mîrê Palo Kejê diavêje zîndanê Salih direve, diçe mala pîrekê û ew pîr harîkarîya Salih û Kejê dike, caba Salih ji bo Keja di zîndanê da dibe û navgînîya wan dike. Motîfa pîrê bi awayekî cuda be jî di varyantên Serhedê da jî heye. Li dû varyantên Serhedê Salih dema diçe Palo li konê pîrê dibe mêvan û bi rêka pîrê xwe digehîne Kejê û wê direvîne. Lê di varyantên din da behsê pîrê nehatîye kirin.

Epîzodên 10an heta 13an, her çend hinek hûrgilîyên cuda hebin jî, hema hema di hemî varyantan da derbaz dibin. Li dû varyantan Salih destê Kejê digire û direvîne û dixwaze xwe bigehîne bin hîmayeta axa û mîrekî xurt da ku ew wan

biparêze û mehra wan bike. Lê belê di varyantên Serhedê da wisa têtê vegêran ku Salih xwestîye axa û begên dikevin rêya wan da biceribîne û ji ber hinde qesta navmala hinek mezinên deverê kirîye. Di hemî varyantan da, her çend nav, cih û hejmar biguhere jî, bi zelalî eşkera dibe ku Salih û Kejê li gelek cihan xwe avêtine navmala malmezînan deverê û piranîya wan malmezînan bêbextî li wan kirine. Ew di rê da tûşî belayên mezin bûne, Salih hatîye girtin û qesta kuştina wî û ji wî standina Kejê hatîye kirin. Di nav malmezînan ku Salih û Kejê xwe avêtî ber bextê wî da yê hema hema di hemî varyantan da şiklekî behsê wî hatîye kirin Hesên Begê Sûrgicî ye. Di rêvîngîya Salih û Kejê ya ji bo peydakirina hîmayekerekî da Kejê her tim ji Salih dixwaze ku bawerîya xwe bi her kesekî neîne. Lê belê Salih gelek caran guhdarîya wê nake û ji ber xemsarîyê, xwe û Kejê tûşî gelek belayan dike. Aqildarî, tedbîr û rêberîya Kejê hema hema di hemî varyantan da dîyar dibe û gelek caran ji ber rêberî û tedbîrên Kejê xwe ji belayan diparêzin.

Nuqteyeke din, ji bilî vegêranên Serhedê, hema hema hemî varyantan da hevpar ew e ku dema axa û begên deverê ku pirî caran ew Hesên Begê Sûrgicî ye, dixwazin Salihî bikujin û Kejê jê wergirin, li Salihî peydabûna tirs û lerezê û revîna wî ye. Di vê derê da motîfa xewê hatîye bikarînan û Salih ji ber bêxewî û westîyanê serê xwe didane li ser çoka Kejê û radikeve. Dema neyar tên û li ser wan hildibin, Salih ji ber bêxewîyê muşewiş dibe û baz dide. Bi tenê hiştina Kejê nav destê xelkê da û revîna Salih bi awayekî vekirî têtê vegêran û Kejê bi kilam û bendan ve tanan diavêje Salih û dixwaze bi şiklekî wî hişyar bike û kela wî ya mêranîyê rake. Piştî dîyalogeke dirêj Kejê dikare Salihî bîne ve li ser hemdê xwe û berê wî bide şerê neyaran. Ji varyantan da baş dîyar dibe ku Salih du caran, carekê xasbexçê mîrê Palo û carekê devera Sûrgicîyan, Kejê bi tenê hiştîye û revîye.

Di serhatîya Salih û Kejê da epîzoda ji bo ravekirinê ya ji hemîyan zehmettir epîzodên çardeh û panzdehan in. Ev arîşe piranî ji ber kêmbûna qeydên berdest ên behsa aqîbeta herdû karekterên sereke dikin, derdikeve meydanê. Li dû varyantên Efrîn-Çiyayê Kurmênc û Serhedê Salih û Kejê bi mirada xwe şa bûne. Varyantên derdora Dîyarbekirê her çend bi hûrgilî behs neke jî wisa dide xuyakirin ku Salih hatîye kuştin û Kejê jî li ser vê çendê xwe kuştîye. Her çend varyantên Êzîdxanê yên berdest da behsê aqîbeta herdû karekteran nehêt kirin jî Gabarî wisa dide dîyarkirin ku Salih di rê da mirîye û Kejê jî çûye mala ‘Elîyê ‘Emo. Lê behsa aqîbeta Kejê nahêt kirin. Mixabin di varyantên din da jî ji ber ku dawîya serhatîyê berdestê me nîne em nizanin kanê aqîbeta wan çî bûye. Lê belê ji ber ku piranîya serhatîyên evînî yên folklorê kurdî bi hevneşabûnê ve bi dawî tên, mumkîn e ev serhatî jî xudanê heman aqîbetê be.

Ji Alîyê Dîrokê ve Hêsgandîna Dem, Cih û Kesên Serhatîyê

Serhatîya Salih û Kejê her çend mijara edebiyata devkî be jî ji alîyê kes, dem û cihî ve teqabulî rastîyeke dîrokî dike. Di varyantên serhatîyê da derbarê kes û cihên rûdanê da gelek agahî hatine danê. Wekî ji varyantan eşkera dibe ev serhatî berê li Palû qewimîye û paşê li devera Sûrgicîyan bi dawî hatîye. Palû di

serdemê Osmanîyan da mîrgeheke kurdî ya bi hêz bû û vê mîrgehê heta dawîya sedsala 17an hêza xwe parast. Lê belê ji serê sedsala 18an wê ve piştî ku me'denên Keban û Erxenîyê di bin îdareyeke bi navê Emaneta Me'denên Humayûn a cuda da hatîye teşkîlîkirin, hîngê her sê mîrgehên navborî bi vê rêveberîya nû ve hatine girêdan. Êdî mîrên van mîrgehan bi şertê pêkînana xizmeta me'denan bi tensîba rêveberên Emaneta Me'denên Humayûn ve hatine te'yînkirin. Berê mîrên wan bi qeyda heyat dihatin te'yînkirin lê belê piştî Emaneta Me'denan tenê ji bo salekê dihatin te'yînkirin. Evê çendê kartêkirineke gelek neyînî li ser van mîrgehan kir û îstîqrara rêveberîyê têk da (Alanoğlu, 2017: 284-287).

Mîrê Paloyê yê dawîyê ku mîrgeha xwe bi îstîqrarî rêvebirî İbrahîm Begê kurê Hesên Begê Palo bû (m. 1663). Piştî wî di navbera kurên wî Mîr Yensûr, Mihemed Qucûr, Silêman û Xelîl da li ser kursîka mîrgehê şer û mîlîlanê çêbûn û her carekê yekî wan mîratî dikir. Lewra heta mîrgeh bi yekcarî xerab bûyî, bêîstîqrarî û şer û mîlîlaneya pismîrên Palo dewam kir (Alanoğlu, 2017: 227-231). Ji vana tiştê Yensûr Begê bi gotara me ve eleqedar dike eve ye ku wî di sala 1681ê da dîwanxane û şaneşînên nestêle û mezin dabûne çêkirin û herwesa di kuncêkî Kela Palo yê hewadar da qesr û koşkeke gelek mezin û bi heybet ava kiribû (Şem'î, 2016: 165-166). Em wisa texmîn dikin ku ew qesr û qonaxa di varyantan da wekî şeş tebeq, asê, bilind û mezin têtê wesif dan û li binê wê selîb û kanî mermerên avê heyî û Salih û Kejê li ser dîwarê birkê suhbet kirî hema her ew avahîyên bi heybet in ên Yensûr Begê ava kirî. Mumkîn e ku serhatîya Salih û Kejê piştî avakirina vê koşkê pêk hatibe.

Di varyantan da ji bo mîrê Palo sê nav têne gotinê: Ferzê/Ferhoyê Uzeyr, Mistefa Beg û Ehmed Begê kurê Heyder Begê. Ji mîrên Palo yên ku navên wan têne zanîn kesekî bi navê Ferzê/Ferhoyê Uzeyr nîne. Lê belê di nava mîrên Palo da yekî bi navê Mistefa Begê heye ku wî di navbera salên 1757-1759ê li Palo mîratî kirîye û paşê ji karî hatîye wergirtin (Alanoğlu, 2017: 258, 286-288, 310). Sala mirîna wî mixabin em nizanîn. Herwesa navê Ehmed Beg lawê Heyder Begê jî di belgenameyên Osmanî da heye. Heyderê di sala 1756ê da mirî li Paloyê mizgeftêk çêkirîye û paşê ev mizgeft tewcîhî kurê xwe Ehmedî kirîye (Çakar, 2018: 29). Wisa dîyar e ku Heyder û kurê wî Ehmed ne ji mîrên Palo belkî ji dewlemend û eşrafên bajarê Paloyê bin.

Em wisa texmîn dikin ku babê Kejê her ji binemala mîrên Paloyê bît. Çunkî ji sala 1720an wê da kesên bi navê Seyfedîn, Seyfûllah, Ebdulxefûr, Mistefa, Mansûr, İbrahîm, İskender, İsmail, Mihemed û Silêman gelek kesên bira û pismam mîratî kirine. Maweyê mîratîya her yekî ji wan pîrî caran salek bû û bi berdewamî dijminahî û mîlîlanê di navbera wan da hebû. Ji ber vê çendê rewşa mîrgehê gelek aloz bûbû û xelkê Palo ji rêveberîya wan ya xerab gelek 'aciz bûbûn. Deftera ahkam a Dîyarbekirê ya di navbera salên 1742 û 1754ê bi gilî û gazindeyên xelkê deverê ve tijî ye (İzgöer, 2016). Lewra wisa dîyar e hem babê Kejê hem jî mîrê wê di serdemên cuda da ji bo mudetêkê mîratî kiribin. Ji ber vê

çendê versiyonên Kejê bi şiklekî wekî keça mîrî an jî wekî jin û bûka mîrî didin nasîn rastîyekê vedihewînin. Di vî halî da ew koşka Kejê tê da têtê sêwirandin jî heman koşk e.

Ji bo peydakirina demê serhatîyê lehengekî din yê dîyarker Hesên Begê Sûrgicî ye. Bi rastî hem di hemî varyantên devkî da hem jî di deqa çapkirî da an behsê Hesên Begê Sûrgicî bi xwe an jî behsê gund û gelfiyên devera Sûrgicîyan derbaz dibin. Navên wekî Kerxan û Kîkan, Sûbirgucê, Şaqîstan, Baqîstan, 'Awênê, Gelfiyê Xîştanê yên di varyantan da derbaz dibin hemî îşaretê bi devera Sûrgicîyan didin. Sûrgicî hem navê eşîretekê û hem jî navê devereke ye. Eşîra Sûrgicî dikeve bakûrê Mêrdîn û rojavayê Stewrê. Ev 'eşîret ji sî û sê gundan pêk tê û merkeza wê gundê 'Awênê ye ku vê gavê wekî Sûrgücû Beldesi têtê nasîn (Tan, 2011: 282-283). Navê 'eşîreta Sûrgicî û gundên wê di sedsala 16an, yanî her jî dema Dewleta Osmanî ew dever vegirtî wê da li nava tehrîrên Osmanî hatine qeydkirin. Şaqîstan û Baqîstan wekî navên du gundên nêzikî 'Awênê di van tehrîran da derbaz dibin (Göyünç, 1991: 79; Erpolat, 2006: 461). Heke bêne li ser navê Hesên Begê Sûrgicî em di belgeyên Osmanî da rastî navê Hesên Begê Sûrgicî tên ku wekî mîrê Sûrgicîyan têtê nasandin. Li dû belgeyên Osmanî, Hesên Beg di sala 1775ê da mirîye (BOA.D.BŞM.MHF, 58/5; AE.SABH. 347/24261).

Heke em bêne li ser Salihî bi xwe, di deftera ahkam a Dîyarbekirê ya sala 1747/8ê da rastî Salihêkî tehsîldar yê bi komkirina bacan ve wezîfedar tên. Li dû agahiyên deftere wergirtina xwîg û rusûmên gundê bi navê Karxîn ku ji xassên hukûmeta Palo ne, ji bo Salihî hatîye raspartin û divê ji bilî wî ji bo kesek din nehêne danê (İzğöer, 2016: 314). Bi rastî heke mirov karên Salihî yên wekî katibî, tehsîldarî û qehwegêrî yên di varyantan da derbaz dibin ber çavan bigire, mumkîn e ku Salihê li jorê behsê wî têtê kirin hema her Salihê lehengê me yê serekî bît. Di vî halî da li dû van agahiyên dîrokî wisa dîyar dike ku serhatîya Salih û Kejê di nîva duyê ya sedsala 18an da qewimîye.

Encam

Serhatîya evînî ya Salih û Kejê di erdnîgarîyeke gelek berfireh da ji alîyê dengbêjan ve têtê vegêran. Zêde belavbûna vê serhatîyê bûye sebebê derkeftina gelek varyantan. Çunkî her dengbêjekî ji dever û hewza çandî ya tê da jîyayî rengêk daye vê serhatîyê. Ji ber vê çendê her varyantekê hinek taybetiyên xwe yên cuda hene. Lê belê ji hev cudabûna varyantan bi rastî di hûrgilîyên serhatîyê da dîyar dibe û serûberê serhatîyê naguhore. Lewra di hinek nuqtan da ji hev cudabûna varyantên serhatîyê ji bo derêxistina gîvilê serhatîyê nabe asteng. Berevajî vê çendê ev varyant hevdu temam dîkin. Pîraniya varyantên devkî li ser You Tube hatine peydakirin. Derbarê qeydên serhatîyê da arîşeya serekî temam nebûna hinek qeydan e.

Serhatîya Salih û Kejê ji bo cara 'ewilî ji alîyê rojhilatnasê Frensî M. Dufresne ve li bajarê Sêrtê ji devê dengbêjekî hatîye tomarkirin. Wî dema ev serhatî berhevkerî ji bo rastnivîsîna wê gelek hişyarî lê kirîye. Dufresne, ev serhatî

di sala 1910ê li Journal Asiatique da belav kirîye. Di nivîsê da pêşgotinek, metnê kurdî û wergera wê ya frensî pêkve hatine weşandin. Me di gotarê da herfguhêziya ev metna çapkirî kirîye.

Ji bo analîz û berawirdîya di navbera varyantên devkî û varyanta çapkirî baş dîyar bibin, me metnên berdest li dû dever û hewza çandî di heft cwînan/birran da tesnîf kirin: Efrîn-Çiyayê Kurmênc, Derdora Dîyarbekirê, Serhed, Deşta Surûcê, Bahdînan, Êzidxane û metne çapkirî (Botan). Naverok û lehengên di her cwîneke varyantan da hatîye danasîn û berawirdkirin. Di hemî varyantan da lehengên sereke ji bilî çend hûrgilîyên biçûk wekî hev in. Arîşeya serekî nasnameya babê Kejê ye. Çunkî Kejê di hinek varyantan da wekî keça mîrê Palo û di hinek varyantan da jî wekî jin an jî bûka mîrê Palo tête danasîn. Di piraniya varyantên serhatîyê da karakterê ku xerabîyê temsîl dike Hesên Begê Sûrgicî ye.

Serhatîya Salih û Kejê ji bajarê Palo dest pê dike û li devera Sûrgicîyan bi dawî dibe. Ev serhatî li ser evîneke platonîk hatîye vehandin. Piştî ku nasyariya herdû lehengan çêbûyî berê Salih li Kejê aşiq bûye û ji bo ku nêzîkî wê be li navmala Kejê dest bi karî kirîye. Sererayî derbazbûna demekî dirêj evîna xwe ji Kejê ra eşkera nekirîye. Paşê Kejê bi kurê mîrê Palo ra zewicîye. Li ser vê çendê ji ber nedîtina Kejê sebra Salihî nehatîye û ji bo ku nêzîkî Kejê be çûye li nav mala mîrê wê navmalî kirîye. Di dawîya dawî da Salihî evîna dilê xwe ji bo Kejê eşkera kirîye, herdû ji hev qayil bûne û biryara revê dane. Ji Palo derkeftine û berê xwe dane başûrî û gehîştine qeza Sûrgicîyan. Di rê da tûşî gelek rûdanên trajîk û diltezînk bûne.

Ev serhatîya li jorê hatîye kurtkirin li ser panzdeh epîzodan hatîye avakirin û bi hev ra hatîye girêdan. Ji ber nebûna metnek an jî varyanteke tekûz a serhatîyê ji bo derêxistina rêzerûdanên serhatîyê, me ji hemî varyantan îstîfade kir. Her çend nivcobûna hinek qeydan wekî kêşe derkeve pêşîya me jî ev kêmasî ji bo tesbîtkirina epîzodan nabe astengeke mezin. Çunkî dema hemî varyant li ser hev têne komkirin bi şiklekî gîvilê serhatîyê derdikeve meydanê û valahiyên varyantekê da heyî bi harîkarîya varyantên din tête tijîkirin. Di epîzodên serhatîyê da motifên cuda cuda hatine bikarînan lewra serhatî ji aliyê motifan ve dewlemend e.

Serhatîya Salih û Kejê her çend aîdê edebîyata devkî be û bi rêka jêderên devkî gehîştibe roja me jî kes û cihên di serhatîyê da derbaz dibin teqabûlî rastîyeke dîrokî dikin. Ji bo peydakirina rastîya kes û cihên serhatîyê jêderên dîrokî hatine bikarînan û di dawîya vekolînê da em gehîştin hinek daneyên dîrokî. Taybetî dûvçûnên li ser mîrên Palo û Hesên Begê Sûrgicî ve em di arşivên Osmanî û berhemên dîrokî da rastî navên van hatin. Herwesa encama vekolînên dîrokî û cografî da me şîya gelek cih û erdan destnîşan bikin. Li dû van vekolînan em gehîştin wê encamê ku ev serhatî di nîva duyê ya sedsala 18an da qewimîye.

Jêder

T.C. Cumhurbaşkanlığı Devlet Arşivi Başkanlığı, Osmanlı Arşivi (BOA):

Ali Emiri, Abdülhamid I (AE.SABH) 347/24261, 10.04.1189/10.06.1775.

Bab-ı Defteri, Muhallefat Halifelîği (D.BŞM.MHF) 58/5, 10.04.1189/10.06.1775.

İzğöer, A. Z. (2016). Divan-ı Hümâyûn Sicilleri, Diyarbakir Ahkâm Defterleri,1 Numaralı Defter (H. 1155-1167/ M. 1742-1754). Diyarbakır: Dicle Üniversitesi İlahiyat Fakültesi Yayınları.

Lîteratûr

Akbel, S. (2016). Evîna Pînhan, Keja Gulîsor û Salihê Nasir Axa. İstanbul: Nubihar Yayınları

Akbel, S. (2018). Gizli Kalmış Bir Aşkın Hikâyesi. İstanbul: Tuba Kitabevi.

Alanoğlu, M. (2017). Osmanlı İdârî Sistemi İçerisinde Palu Hükûmeti. Yayınlanmamış doktora tezi, İstanbul Üniversitesi, İstanbul.

Çakar, E. (2018). Hurufat Defterlerine Göre 18. Yüzyılda Palu. Vakıflar Dergisi, 49, 21-40.

Dufresne, M. (1910). Un Conte Kurde De La Région De Sö'örd Transcrit Et Traduit. Journal Asiatique, Dixième Série, Tome XV, Paris: Imprimerie Nationale, 107-117.

Erpolat, M.S. (2006), Tahrir Defterlerine Göre XVI. Yüzyılda Mardin Sancağı'ndaki Aşiretler. I.Uluslararası Mardin Tarihi Sempozyumu Bildirileri 26-28 Mayıs 2006 içinde (s. 448-466). İstanbul: Mardin Tarihi İhtisas Kütüphanesi Yayınları.

Göyünç, N. (1991). XVI. Yüzyılda Mardin Sancağı. Ankara: Türk Tarih Kurumu Yayınları.

Kaplan, Y. (2022a). Di Navbera Çanda Nivîskî û Devkî da Beyta Feqîyê Teyran. Nubihar Akademi, 5 (18), 11-45. DOI: 10.55253/2022.nubihar.1215773

Kaplan, Y. (2022b). Helsingandinek li ser Cureyên Vegêranê yên di Folklorê Kurdî da (Destan, Beyt û Vegêranên Strankî) . International Journal of Kurdish Studies, 8 (2), 273-292. DOI: 10.21600/ijoks.1144690

Sönmez, N. (2021). Di Kilamên Dengbêjîyê da Bûyera Mûsa Begê Mûşê û Gulîzarê. Nubihar Akademi, 4 (16), 102-123. Retrieved from

<https://dergipark.org.tr/tr/pub/nubihar/issue/67778/874176>

Subaşı, K. (2023). Fesad û Bêbext di Trajedîya Evînê da: Weku Nimûne Destanên Evîna Mêjûyî. Mukaddime, Özel Sayı - Klasikten Moderne Aşk Mefhumu, 148-176. DOI: 10.19059/mukaddime.1243035

Tan, A. (2011). Turabidin'den Berriyê'ye, Aşiretler, Dinler, Diller, Kùltürler. İstanbul: Nubihar Yayınları.

Tek, A. (2021). Eskatolojî, di Edebîyata Kurdî de Numûneyên Wê û Nû-varyanteke "Beyta Sekeratê" . Nubihar Akademi , 4 (16) , 15-43 . Retrieved from <https://dergipark.org.tr/tr/pub/nubihar/issue/67778/1035607>

Online

Baqî Xido (2020). https://www.youtube.com/watch?v=CFdT_gduWco
<https://www.youtube.com/watch?v=LoUOPLec2CU&t=6s> (Dîtin 05.01.2023)

- Evdilhadî Arzûnoglu (2018). <https://www.youtube.com/watch?v=hdNHNRpxsGg> (Dîtin 06.01.2023)
- Henîfê Minazê (2020). https://www.youtube.com/watch?v=PG9S7oigr_M. (Dîtin 07.01.2023)
- Hesen Nazî (2018). https://www.youtube.com/watch?v=Zl6m6lp_X58. (Dîtin 08.01.2023)
- Hesenê Şîlbê (2021). <https://www.youtube.com/watch?v=Lh9ZvhhXV4E> (Dîtin 09.01.2023)
- Îbrahîmê Pîrikî. (2022). <https://www.youtube.com/watch?v=CmORKSbTfu0>. (Dîtin 10.01.2023)
- Lezgîn Seydo, Celo Şingalî (2012). <https://www.youtube.com/watch?v=xmRzaqygi-A> (Dîtin 12.01.2023)
- Mecîd Hemgulî (2021). <https://www.youtube.com/watch?v=wuZp7BKVp30> (Dîtin 15.01.2023)
- Menanî Fayîq (2020). <https://www.youtube.com/watch?v=T6A8ifbub-s> (Dîtin 18.01.2023)
- Mihemed Pîro û Casim Şîkakî (2017) Varyantek Salih û Kejê (Berhevkar) Yaşar Kaplan.
- Nadir Zêtî (2021). <https://www.youtube.com/watch?v=Q1bRejsXVoo> (Dîtin 20.01.2023)
- Pîr Miço (2020). <https://www.youtube.com/watch?v=Kyy3Wr5ONdc> (Dîtin 22.01.2023)
- Remzî Ehmed Çawûş (2022). <https://www.youtube.com/watch?v=TMDKbmzcs1l> (Dîtin 23.01.2023)
- Reşêd Mem Çûçanî û 'Elî Kabê (2012). <https://www.youtube.com/watch?v=5MwgXxLKuic>, <https://www.youtube.com/watch?v=5SQaAUcbiB4>, <https://www.youtube.com/watch?v=VN6xG1dINeY> (Dîtin 24.01.2023)
- Seid Gabarî (2020), <https://www.youtube.com/watch?v=Psgq1uxSr4> (Dîtin 27.01.2023)
- Sidiq Karliova (2017). <https://www.youtube.com/watch?v=OPX3pnUcw2Y&t=685s> (Dîtin 28.01.2023)
- Şakiro (2020). <https://www.youtube.com/watch?v=44HqZsop9oM> (Dîtin 29.01.2023)
- Ubeyyit Altun, 2021, <https://www.youtube.com/watch?v=V6nhNkANvUM> (Dîtin 30.01.2023)
- Zahiro (2020). <https://www.youtube.com/watch?v=8ZK8zWWMeH8> (Dîtin 02.02.2023)

Servehî I

KÄZZE⁽¹⁾ û ŞALŌ⁽²⁾.

Käzže hoastia Mire Paloî bu. ŞalŌ dele wî kattêhu lê Käzže, u käzžezi ŞalŌ dëvabu⁽³⁾. Dêlewan eba'v kattêbu. Rozek'ay⁽⁴⁾ ditên qaule wan kêrên. Käzže ve ivare we 'erri gundekeî, u ŞalŌ sûre sêbe we 'erri beg'êzi Käzže. u hjarren bêlêneva. Çera lê ve gunde? Zê tersa Mir na dekarên şerela wan békên : ia'ni av u du bêstinên.

Sûre sêbe ŞalŌ çö ve gunde. be'avra dârkatten, dâste av u du gûrtên u b. reva cön. Ve gavê du braie Käzže 'abu, iek 'abo, iek Bêker buan. hjaran : penê pësmame wan 'abu. Peî ŞalŌ u käzže kattên. Gûsten ŞalŌ u Käzže. Gazie ŞalŌ kêrên : avâ am hattên paie ta bebalte ame ta békuzên. ŞalŌ dâste da sûre zaraf. çö. sûre 'ar alta zekêr.

CHANTÉ.

'Abo, Bêker: 'abo. Bêker. ŞalŌ tu şerîni nalâ⁽⁵⁾ zekêr. Ve ivare avale ma rabun hâre hōa dâna kurta gëdia⁽⁶⁾ qoga Diarbêkêr.

Cön Diarbêkêr : lëvedêrzi keski na wari me're Käzže lê ŞalŌ bekra, zê tersa Mire Paloie. Käzže zêneki badân bu : lëkudêr dëcobun : halq çave hōa dëdabun Käzže. Lê Diarbêkêrzi ipsês⁽⁷⁾ 'abu : çave dan käzže. käzžezi bê hjarie wan hjaran. Gota lê ŞalŌ : raba, ame zêvi bazare bëcên, na hōa dëvên qu ta békuzên u mên ze hōara bëbên.

CHANTÉ.

Käzže sûre mên begorio. Diarbêkêr cendi pa'ana. Te dëgarin 'askaran u romian u 'aitan⁽⁸⁾ u nezâm u qawazan. Ve ivare avale ma rabuna, Bâre hōa dâna kerhanukikâna.

Dêlele käzže gëgara dële ŞalŌ.

Çona kerhakikan, çon gunde ki, nave wi 'awena bu, na kâzže zëneki bēdāu wa : ma'aluma, lēkudēr dēçōn : çave dēdabun Kâzže, Šaloži, le hazera zeda nakēm, lauki baš bu, sār haši bu⁽¹⁾, Lē ve gundeži šora hōā kērēn ; gōtēn : ame Šalō bēkužēn u Kâzže že bēstinēm, 'Audek gōtēn : lēnava gund am bēkužēn na mēnasaba, bēla⁽²⁾ žē gund derkavēn, bēla çar zalamek lēpeī bēkavēn, Šalō bēkužēn u Kâzže vegērēn binēn. V säre ve çauke sakēnin, Kâzže bē hūlaie wan hašia, Žera hal u hawale gundian çasat ker, Tašte wan anīn ; niv hōārēne wan na hōārēn u rabun ria⁽³⁾.

Ša'atēki žē ve gunde dur bun, çar zēlam lē peī wan kattēn : se' çar tēfang buan takandēn, Šalō tersia sa'u⁽⁴⁾ le katt, Çona Kâzže gērtēn, zē Šalō anīn, Na Kâzže zënek bēdawa ; dama habar bēda keifa wan 'ar çar zēlama da hat, Kâzže bē Šalō zahf dēsauti u ušan bawarie wi 'aia lēkuder bekata⁽⁵⁾ gē'e taŋgaī weī wi balaš bēkra, U paši tēšteki že dernaket, u maia lēve sēkeni, Kâzže gota wan çar zēlama : belki hode mēn na kerēbu qosmata Šalō, belki hode kerēbu qosmata iek žwan 'ar çara, Hūn ezne mēn bēdēn iek kēlamēk lē Šalō bēžēm, Iek žwan go : na hēlēn habarek lē Šalō bežēt ; 'ar se' maī gōtēn : beza : am çarēn, au iaka be, am säre wi havežēn.

ÇUANTÉ.

Kâzže go : Šalō säre mēn begorio, nawala baçestana šaūti begāzz u hia, çar paīā 'aweni žē weva tēn hē'edīa, Šalō 'ağeb u 'ağeb Kâzže žē Šalō standīa⁽⁶⁾.

PARLÉ.

Di sal⁽⁷⁾ Šalō an Šalōia rañnek peī nakirīa : gārek di Kâzže gota wan 'ar çar zēlama : hūne ezneki bēdna mēn, aze habarek di le bežēm, 'awe çarpoz⁽⁸⁾ gota wan : na hēlēn bežēt, ay, we bema bēkužēt u Kâzže beba, 'Ar se'maīn ezēn dani, Goten kâzže : beza : we çibēkara bēka.

GHANTÉ.

Kāzže go : Šalō säre mên bēgorî : rawala baqestana šaŋtî hejar ša-
qoqa⁽¹⁾. Ğar paiat 'awenî zēweva tēn bēgorî loqa. İek Hassen. İek Bakkoia,
iek çaroqa⁽²⁾, edi sēubel boqa⁽³⁾.

PARLÉ.

Di sal Šalō au Šaloia qat na labottî u Kāzže dēlewi zaĥf pe dešanta.
Kāzžezi zēneki bēdaua dama huan habardēda zaĥf pe šā dēbun. Gota
wan : ĥune ezneki bēdna mēn kalamek di le bežem. Di sal awe Qarqoz
qabul nakêr : 'ar se' zēlame di gotēn : Kāzže, beža.

GHANTÉ.

Kāzže go : Šalō säre mēn bēgorî : ĥina sēt ĝar hēmēn ĥina. Tu raba,
aniške hoā lēqāukabe mērtal leha rišia lēbezna, zērav wergērina. Šalō ta
dēgo : aze Kāzže hoā l.ravinēm bēbēm mala qaul sēmdina.

(Même scène : elle demande encore la permission de dire un mot.)

GHANTÉ.

Kāzže go : Šalō säre mēn bēgorî. Ta dēgo : az Šaloiem, Šaloie bela
dinēm⁽⁴⁾ hoāie šure zērav šamî šihani deve ešm. Ta dēgo aze Kāzže hoā
zē nav gawar u 'ağama bē šure zērav bēderinēm.

PARLÉ.

Zē vi habare mūe Šalo rabu wei⁽⁵⁾ sužēn bēkēras u ĥami ĝellewi dārket ;
u av 'ar çar zēlam u Kāzže nezike gund bu bun, İek arvaz mabu lēbār
gund ; ĝarek di ezēn zēwan hoast u got :

GHANTÉ.

Kāzže got : Šaleho çav dereşi⁽¹⁾ çav bellaki⁽²⁾, hoaiç mertale şor behe-
leki, waki zêta na dêhat, çera ta dāste mên da berri zê borğa bellek⁽³⁾ u
ze bab u keki.

PABLÉ.

Šalô dāst da şure zêrav u bazda : ço säre sêse' zwan zeker, u 'awe
qarpoz saqat kër u gota wi : arra, beza mazên u ma'çule gunde awa :
avan qu rekêrên⁽⁴⁾ täre karafune⁽⁵⁾ mên nakêrên, bêla täre taştike ze
mara rekên. Šalô dāste Kāzže gërt, çon lê säre gund u gazi le wan kër.
Got : Warrên, gali sâri mire awan! Hên gotên : ame harrên pei wi,
hëndli gotên : walla'! am nekêrên wi, albet, av mere qu av zên ravandia
'evi zêhoa aia : mereki başa sâr hatia. Bu şev lê sâr van.

GHANTÉ.

Šalo go : 'oia⁽⁶⁾ set gar bêmên 'oia. Dar u deri lêma Çavian, şor
çelloia, aze dāste kāzže hoā bēgrên, bēhêm çam⁽⁷⁾ Mire Paloia.

PABLÉ.

Bue şeve, breda çon 'atta bu sêha lê sâr wan, Gundek rasti wan hat,
bye gunde çon. Dêrgaiek mazên lēbâr wan hat. Au dêrga hanie mala

are bu, peşt dârga du dek 'abu. Kâzze aliek hunêst u Şalo aliek hunêst. Aya ze zor hat, bêvî dâst ave masin bêdâst. Di Şalô u Kâzze lêvedêr hunêstên : zê wan pers kêr : hun beçî şerol hatêna la'a. Zê sare hatta paşî qasat⁽¹⁾ ker u goten zera : maqsada hode u ta keria. Ve sâ'ate mir gazia qarwaş u hulama ker. Gota qarwaş : Kâzze bêba nav pîrêka⁽²⁾ u Şalo bêba diwane. Mir êo dâst ava hoâ ker u hat lêdiwane, u go : walla'! aze iro nakajê wan békem.

LAGA CHANTE :

Gazia Hjoho békên, gazia Lolo bekên
Bela Hjoho bêdâf leha⁽³⁾, u bela Lolo lê zerneha, u gazia
malla' békên, bêla mehre Şalo u Kâzze bê 'av bela⁽³⁾.

On répète à la fin de chaque strophe :

Delele Kâzze gégara⁽³⁾ dèle Şalo.